*Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê*
*Kurdistan National Congress*
*Congrès National du Kurdistan*

KNK

*Rue Jean Stas 41 1060 Bruxelles tel: 00 32 2 647 30 84*
*Homepage:* www.kongrakurdistan.net *e-mail:* kongrakurdistan@gmail.com

# DI 8Ê ADARA 2018´AN DE JINÊN KURD QEZENCÊN NETEWEYÎ KIRIN YÊN GERDÛNÎ

Li Kurdistanê bi beşdarbûna çalak û bi vîna azad ya jinan di hemû beşên jîyanê de, rê ji bo Kurdistaneke nû hat vekirin. Li hin parçeyên Kurdistanê sedema serkevtina li dij şer û dagirkeriyê ya bingehîn, beşdarbûna jinan a bi vîn û berpirsiyariya nîştimanî ye. Niha ev rastî di berxwedana Kantona Efrînê ya Rojavayê Kurdistanê de xwe nîşan dide. Ji meheyekê zedetir e, gelê me li Efrînê beramberê hovîtîya Dewleta Tirk û bêdengîya dewletên pêywendîdar di nav berxwedaneke dîrokî û pîroz de ye. Jinên Kurd ev 7 sal in, li Rojava û Bakurê Sûriyeyê bi têkoşîna xwe li Efrînê binesazîya civakeke wisa afirandine ku ev civak nikare bi ti awayî were şikandin. Civak di bin hemû şertên şerê qirêj yên Dewleta Tirk de, li ber xwe dide. Jinên Kurd li Bakur, Rojhilat û Başûrê Kurdîstanê bi çalekî, liv û tevgerên xwe piştgîrîyê didin xwîşkên xwe yên li Efrînê. Ji ber ku serkeftina Efrînê wek misogerîya azadîya xwe ya neteweyî û jinê dibînin.

Hêzên dagirker jî, dibînin ku êdî Kurdistan ne ya berê ye û di pêşengtiya jinên Kurd de Kurdistaneke azad û demokratîk di nava agirê Şerê Cîhanê yê III. de, tê avakirin. Ev jî dikeve xizmeta hemû jin û gelên Rojhilata Navîn. Hêzên ku tenê ji bo berjewendîyên xwe şerê serdestîyê dikin, demokrasî û azadîya bi destê jinan naxwazin.

Ne tenê li Kurdistanê, jinên Kurd bi ezmûnên xwe yên têkoşîna azadîyê êdî bûnê pêşengên pênase û zelalkirina du hedefên çareseriya mirovahîye. Peywên wek demokrasî û azadî li Kurdistanê bûne xwedîyê naverokeke nû û cuda. Di serdema Clara Zetkin de azadiya jinan giredayî têkoşîna çîna karker û proleteryayê bû. Ew dihat wateya ku azadîya jinan giredayî ya mêran bû. Ji ber ku him ji alîyê feraset û him jî, ji aliyê jîyanê ve proleter û karker zêdetir wek mêr dihatin fêmkirin. Li Kurdistanê ev teorî û pratîka sedsala 20an di destpêka sedsala 21an de, ji bingehê ve hat guhertin. Azadî û demokrasîya mêr û civakê giredayî tekoşîna jinan e.

Ji ber vê jî, mirov dikare bibêje, tevgera azadiya jinên Kurd kemasîyeke sedsalî ji bo tevahiya mirovahîyê sererast kir. Li Kurdistanê ev rastî hatiye pejirandin. Di navenda peyvên wek azadî, demokrasî û wekhevîyê de azadîya jinê xwedî roleke navendî ye. Êdî ev encam wek rastîyeke nû ji sînorên Kurdistanê derketiye û heyecan û hêviyê dide mirovahiyê.

Ji bo 8ê Adara 2018an dikarê bê gotin ku qezencên jinên Kurdistanî bûn qezencên cîhanî.

Ji bo vê jî em bejna xwe li himber hemû jinên Kurd, yên ku bi berxwedan û keda xwe em anîne roja îro, bi rêz û hurmet ditewînin.

Wek jinên Kurd em serbilind in ku, me têkoşîna Clara Zetkin û hemû jinên şoreşgerên mezin ên cîhanê vegeradin ser hîme jinên ku ji berîya hezar salan li Kurdistanê û li Mezopotamyayê binesaziya jîyana azad li ser bingeha felsefa dayîksalariyê ava kiribûn.

Em di serî de 8ê Adara 2018an li jinên berxwedêr yên li Efrînê; yên li Bakur, Rojhilat, Başûr, Rojavayê Kurdistan û li derveyê welêt pîroz dikin.

**Komîsyona Jinan a KNKê**

**7ê Adarê 2018**